



K.T.

**Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî**

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

**BERAWIRDKIRNINA SÊ GUHARTOYÊN
DESTANA FILÎTÊ QUTO**

HİKMET ALPAR

13721091

Şêwirmend

Alk. Doç. Dr. Mustafa ASLAN

MÊRDÎN 2018

KURTE

Mebesta vê xebatê muqayesekirina sê guhertoyê Destana Felîtê Quto ye. Guhertoyên Destana Felîtê Quto yê ku di vê xebatêde hatine muqayesekirin; guhertoya Dengbêj Karapêtê Xaço, Dengbêj Reso û Dengbêj Nesoyê Agirî ye. Di destpêka beşa yekemîn de bigiştî di derbarê êlên Reşkotan û Etmankan de agahî tîndayin. Di berdewama beşe de agahiyên di derbarê jiyana dengbêjan de tîndayîn û tekstên wariantên wan tînpêşkeşkirin. Di beşa duyemîn a vê xebatê de analîz li ser guhertoyên destanê tînkirin û xalên hevpar û cuda yê her sê guhertoyan tînpêşkeşkirin.

Bêjeyên Sereke: Destan, Dengbêj, Felîtê Quto, Reşkotan, Etmankan

ÖZET

Bu çalışmanın amacı Felitê Quto Destanı'nın üç varyantının karşılaştırılmasıdır. Çalışmada karşılaştırılan Felitê Quto Destanı'nın varyantları şunlardır; Dengbêj Karapêê Xaço, Dengbêj Reso ve Dengbêj Nesoyê Agirî varyantlarıdır. Çalışmanın birinci bölümün girişinde Reşkotan ve Etmankan aşiretleri hakkında genel bilgiler verilmiş, bölümün devamında dengbêjlerin hayatları hakkında bilgiler verilip daha sonra da dengbêjlerin varyantları sunulmuştur. Çalışmanın ikinci bölümünde de destanın her üç varyantının ortak ve farklı noktaları sunulmuştur.

Anahtar Sözcükler : Destan, Dengbêj, Felitê Quto, Reşkotan, Etmankan

PÊŞGOTIN

Mebesta amadekirina vê xebatê berawirdkirina (muqayesekirina) sê varyantên destana Filîtê Quto ye. Ji ber vê jî min di xebata xwe de li ser sê varyantên destana Filîtê Quto yên ku bala min kişandin lêkolîn kirin. Berî ku ez vê xebatê bikim, min derheqê destana Filîtê Quto de kêmtir dizanîbûn; lê piştî ku min dest bi vê xebatê kir ez rastî gelek varyantên vê destanê hatim.

Zimanê varyantên ku min li ser wan lêkolîn kirin bala min pir kişandin, ji ber ku zimanê varyantan bi giştî pir dewlemend, xwerû û balkêş in. Gava ku min li ser Destana Felîtê Quto lêkolîn kir; min jiyana gundan, tekiliyên mirovan, tekiliyên aborî, kevneşopiyên gel, têkiliyên biçûk û mezinan û gelek tiştên din dît.

Weke ku tê zanîn destanên gelêrî di nav gel de berê, ji aliyê çîrokbêjan, dengbêjan û mirovên extiyar ve pir dihatin gotin. Lê di dema îro de destanên me ji aliyê kêmtir mirovan û hin lêkolîneran ve tên zanîn. Ji ber vê rewşa civata me; divê lêkolînên bi vî rengî pir bên kirin. Lewre nenaskirina berhemên bi vî rengî di wêjaya Kurdî de valahiyek mezin çê dibe. Mirov dikare digel hemû zehmetiyên jî wêjeya xwe lêkolîn bike û dewlemendtir bike.

Di dawiyê de ez vê xebatê diyarî gorbihîşt, rehmetyê, kalikê xwe Siloyê Edo dikim û spasîyên xwe pêşkêşî hevalên ku bi min re bûne alîkar dikim.

NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	II
PÊŞGOTÎN	III
NAVEROK	IV
DESTPÊK	1

BEŞA YEKEMÎN

DENGBÊJ Û GUHERTOYÊN DESTANÊ

1. Agahiyên Sereke yên di derbarê Bûyerê de	2
2. Jînenîgariya Dengbêj Karapêtê Xaço	5
2.1. Varyanta Destana Filîtê Quto ya Karapêtê Xaço	7
3. Jînenîgariya Dengbêj Reso	9
3.1. Varyanta Destana Filîtê Quto ya Dengbêj Reso	11
4. Jînenîgariya Dengbêj Nesoyê Agirî	16
4.1. Varyanta Destana Filîtê Quto ya Nesoyê Agirî	17

BEŞA DUYEMÎN

NIRXANDIN Û ANALÎZA DESTANÊ

1. Xalên hevpar yên varyantan	34
2. Xalên Cuda yên varyantan	34
2.1. Sedema Qewimîna Bûyerê	34
2.2. Ciyê Ku Karwanê Etmankan Diçe Bazirganiyê	36
2.3. Dabeşkirina Formên Bûyerê	36
2.4. Ziman û Naveroka Waryantan	36
2.5. Barê Karwanê Etmankan Çi Ye?	37
ENCAM	38
ÇAVKANÎ	40

DESTPÊK

Di vê xebatê de sê varyantên destana Filîtê Quto bi awayekî berawirdî hatine analîzkirin. Ji ber ku Destana Felîtê Quto dinav gel de gelekî berbelav û gelekî tê nasîn min wek mijara vê projeyê ev destan hilbijart.

Di xebatê de dengbêjên ku guhertoyên wan hatine pêşkeşkirin: Dengbêj Karapêtê Xaço, Dengbêj Reso û Dengbêj Nesoyê Agirî ne. Sedema hilbijartina van dengbêjan:

Karapêtê Xaço, di nav Kurdan de pir bi nav û deng e. Ji ber ku bi dehan salan di Radyoya Erîwanê de xebitîye, ji aliyê gelek Kurdan ve tê nasîn û îro jî populer e.

Dengbêj Reso, ji ekola Evdalê Zeynikê ye û şopînerê ekola wî ye. Evdalê Zeynikê di nav Kurdan de wek dengbêjê herî kevin tê nasîn. Dîsa ew wek Homerosê Kurdan jî tê naskirin. Evdalê Zeynikê bi sedan dengbêj perwerde kirine û gelek klamên wî bi rîya şagirtên wî gihastine roja me. Îro jî bandoreke xurt a Evdal, li ser dengbêjan heye.

Dengbêj Nesoyê Agirî, li herêma serhedan, bi taybet li Agirî, Mûş û li Qersê tê naskirin. Sedema hilbijartina min a vî dengbêjê jî ev e ku varyanta wî hem gelekî berfireh, hem jî naveroka wê pir balkêş e.

Armanca vê xebatê diyarkirina xalen hevpar û xalên cuda yên van her sê varyantên Destana Filîtê Quto ne. Di dawîya xebatêde; dê analîz li ser van hersê varyantên destanê dê bêne kirin û xalen hevpar û cuda yên destanê dê bêne tesbitkirin.

Ev xebat ji du beşan pêk tê. Di beşa yekem de agahiyên giştî yên di derbarê bûyerê de hene. Eşîrên di destanê de kîjan in, li ku bi cî ne, bi çi karî mijûlin? Di derheqê eşîran de agahî tînin dayîn. Di berdewama beşêde agahî di derbarê jiyana dengbêjan de tînin dayîn û tekstên destanên wan tînin pêşkeşkirin.

Di beşa duwemde, xalên hevbeş û xalên cuda yên van her sê varyantan dê bînin pêşkeşkirin, analîz û nirxandina tekstan dê bînin kirin.

BEŞA YEKEM

DENGBÊJ Û GUHERTOYÊN DESTANÊ

Di destpêka ve beşêde agahiyên derbarê bûyerêde tên dayîn û agahiyên di derbarê eşîrên **Reşkotan** û **Etmankan** tên dayîn.

Di berdewama beşêde agahiyên di derheqê jiyana dengbêj **Karapêtê Xaço** de tên dayin û varyanta destana Felîtê Quto ya ku ew distrê tê pêşkeşkirin. Di pirtûka Salihê Kevirbirî ya bi navê "Filîtê Quto" de ev varyant û du varyantên din hatine çapkirin. Di pirtûkê de li ser bûyerê bi dirêjahî tê rawestandî.

Di berdewama vê beşê de di der heqê jiyana **Dengbêj Reso** de agahî tên dayîn û varyanta destana Felîtê Quto ya ku ew distrê tê pêşkeşkirin.

Di dawiya vê beşê de jî di derheqê jiyana **Dengbêj Nesoyê Agirî** de agahî tên dayin û varyanta destana Filîtê Quto ya ku ew distrê tê dayîn. Varyanta Dengbêj Neso, bi qasî ku min lêkola ta niha ne hatiye deşîfrekirin û çapkirin.

1. AGAHÎYÊN SEREKE YÊN DERBARÊ BÛYERÊ DE

Berî ez dest bi Destana Filîtê Quto bikim ez dixwazim pêşi averûyên dengbêj û varyantê vebêjim.

Di cîhana akademik de gelek vegotinên li ser peyva dengbêj hene. Mamoste û lêkolîner Canser KARDAŞ di pirtûka xwe ya bi navê **Aşîgîn Sazî Dengbêjin Sesi** de bi berfirehî qala dengbêjan û berhemên wan dike. Berhemên dengbêjan lêkolîn dike û wan tesnîf dike. Dîsa mamoste di heman pirtûka xwe de li ser vegotina peyva *dengbêj* bi berfirehî disekine gelek mînakên vegotina peyvê dike û piştê jî vê vegotinê dike û dibêje:

“Dengbêj: Hûnermendên gel an jî hozanên ku di berhemên xwe de qala buyerên dîrokî yên wek şerên eşîran, şerên eşîr û desthilatan, qewimînên xwezayê yên wek erdhej, lehî û hwd. qala mijarên evîn, qîz revandinê dikin. Di berhemên xwe de çîrokên gel dibêjin. Hûnera xwe li hin herêman bi enstrûman li hin herêman bê enstrûman saz dikin, civakê ji her alî ve nas dikin, tore û edetên civakê baş dizanin û aliyan civakê yên baş û yên ne baş di berhemên xwe de vedibêjin.”¹

¹ Canser KARDAŞ, **Aşîgîn Sazî Dengbêjin Sesi**, Girişim Matbaacılık, 2017, Ankara r. 10

Peyva varyant rahên xwe ji zimanê latînî distine, ji latînî derbasî frensî dibe û di kurdî de jî tê bikaranîn. Varyant di kurdî de wek ‘guherto’ jî tê bikaranîn. Di ferhengê de tê wateya rêçika ku li ciyekî ji rêya sereke vediqete û piştê dîsa vedigere ser heman rêyê. Yanî riya duyemîn.

Varyant: Navê her şikleki cuda yê berhemeke wêjeya devkî ye.

Dastana Filîtê Quto, beşeke balkêş a têkiliyên kurdan ên dema feodal radixe ber çavan. **Filîtê Quto** serokê **Eşîra Reşkotan** e. Ku îro eşîr bi giştî li **Herêma Xerzan**, bi taybet jî li **Qubîna Êlihê** û derdora wê berbelav e.

Nivîskar û lekolîner Mihemed Seîd Temel, pirtûka xwe ya bi navê **Eşîra Reşkotan** bi temamî li ser eşîra Reşkotan nivîsiye. Pirtûk, Eşîra Reşkotan û dîroka wê ji her alîve radixe ber çavan.

Mihemed Seîd Temel di heman pirtûka xwe de dibêje:

“Rahên mezinên eşîra Reşkotan digihîjin Mîrêkiya Hekarîyan.”²

Mamê Eme Etmankî serokê **Eşîra Etmanka** ye, Eşîra Etmankan jî eşîreke gelekî mezin e. Ev eşîr di wan deman de karên bazirganîyê jî dike. Eşîr îro bi giranî li der û dora **Bedlîs** û li **Serhedan** berbelav e. Navenda wê **Qesrika** geliyê Bedlîsê ye.

Filîtê Quto, gelek caran ji karwanên ku di eqarê wî re derbasdibûn baca rê distend. Dema ku karwanê Etmankan jî ji karwanîyê vedigere ku here, ber bi Bedlîsê di eqarê wî re derbas dibe. **Filîtê Quto** jî diçe pêşîya karwan û baca rê ji Etmankîyan dixwaze. Her çiqas diya Filît dibêje: “Filît neçe pêşîya karwanê Etmankan. Karwancî gûne ne, çavê jin û zarokê wan li rê ne” jî Filît, bi ya diya xwe nake û diçe pêşîya karwanê Eşîra Etmankan.³

Emê Etmankî dema dibihîze ku Filîtê Quto ketiye rê de; biraziyê xwe Eliyê Etmankî, ji bo navbeynkariyê dişîne bal Filît. Her çiqas Emê Etmankî bixwaze ku hin diyariyan wek baca rê bide Filîtê Quto jî, Filît wan diyariyan qebûl nake û doza tivinga (**Bazinbelek**), ku li milê biraziyê Mam e dike. Dema Mamê Emê dibihîze ku Filît doza bazinbelekê dike vê yekê qebûl nake û dibêje Filît: “Ger ku em tivingê

² Mihemed Seîd Temel, **Eşîra Reşkotan**, Nûbihar, 2016, İstanbul, r. 115

³ Fadime POLAT (Ed.) **Ortaöğretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı**, Tarih Vakfı Yurt Yayınları, 2010, İstanbul, r. 79

bidine te dê em ê bi çi halî di nav eşîra re derbas bin û biçine nava eşîra xwe? Mirin ji vê yekê ji me re çêtir e.”

Mamê Emê vê pêşniyarê jî li Filîtê Quto dike ku dibeje:

“Bi berdana pîreka, bi Rabbê Alemê! Em bi silametî herine malê, mîna berê, fenanî caran. Ezê şevê, ji te re lawo hêstira pêşî, bi barê wê ve, girêdana Emê, Şeşxana milê wî, payîdarê zêra bişînim nîşan e.”

Lê Filît ve pêşniyarê jî qebûl nakê û Bazinbeleka li milê Eliyê Etmankî dixwaze. Li ser vê yekê Mamê Emê dibêje Filît “Bazinbelek qelenê diya te Şemê ye.”

Piştî vê gotina Mamê Emê şer di navbera Reşkotî û Etmankan de derdikeve û Mamê Emê Etmankî, Filîtê Quto dikuje. Destan bi lorîka ku, Şemê li ser kurê xwe Filît dibêje bi dawî dibe.

Di vî şerî de Mamê Emê Etmankî û biraziyê wî Elî jî tê de 52 zilamên Etmankan tên kuştin. Paşê Etmankî ji bo ku tola xwe ji Reşkotîyan bistînin tene şer; lê ji ber ku Reşkotîyan jî haziriya xwe kirine; eşîrên din ên li herêmê bi hev dişewirin û nahêlin şer mezintir bibe. **Eşîra Pêncînarî** li Misircê dikeve pêşiya Etmankan û wan bi paş ve vedigerînin û şer mezintir nabe.

Dema qewimîna bûyerê ne diyar e. Hin kes dibêjin li dora salên 1880 – 1890î de bûyer qewimî ye. Baki BAĞIŞ ê ku mezinek ji Etmankayê Bedlîsê ye dibêje:

“Bûyer beriya bi 180 salan qewimî ye.”⁴

Li ser vê mijarê Mihemed Seîd Temel dibêje:

“Bûyer di salên derdora 1860 û 1870yan de diqewime.”⁵

Destan ji aliyê dengbêjên mîna Reso, Karapêtê Xaço, Şakiro, Mihemmed Arif Cizrawî, Salihê Qubînî, Huseynê Mûşî û bi dehan dengbêjên din ve jî tê gotin.

⁴ <http://www.atmalilar.org.tr/yazi/203/sn-baki-bakis-beyefendi-ile-roportaj.html>

⁵ Mihemed Seîd Temel, b.n.b. , r. 139



1.1. JÎNENIGARIYA KARAPÊTÊ XAÇO

Li gundekî bi navê **Bileyderê** ku îro bi ser Êlihê ve ye hatiye dinyayê. Bi eslê xwe Ermenî ye. Xaço yek ji dengbêjên herî bi nav û deng e. Sala ji dayikbûna wî ne diyar e. Sê salên cihê ji bo jidayikbûna wi tên dayin ku ev sal jî

salên 1900/1903/1908 in.

Di bûyerên sala 1915an de dê û bavê wî tên kuştin. Ew û xwişk û birayê xwe û zarokên din bi dilrehmiya kujeran(!) rizgar dibin.

Piştî bi çend salan xwişka wî ji aliyê Kurdekî misilman ve tê revandin. Karapet piştî ku xwişka wî dizewice li cem xwişka xwe bi cî dibe. Zavayê Karapêt xulamê kurê Filitê Quto, Hesên bû. Karapêt ji xwişka xwe re şixul, kar û bar û şivantî dikir. Karapêt ji bo wan salan dibêje: “Ez xulamê xulaman bûm.”

Karapêt hîn di heşt saliya xwe de dema ku diçe ber pez dengbêjiyê ji dengbêjekî kor yê binavê **Şako** hîn dibe. Karapêt dema ku diçe ber pezê xwişka xwe gelek stranên çêdike û roj bi roj nav û dengê wî zêde dibe.

Karapêt pişt re dibe dengbêjê kurê Filitê Quto. Kurê Filitê Quto, Hesên, gelekî qedr dide Karapêt. Êdî Karapêt ji qesr û odeyan kêmbû. Karapêt jiyana xwe ya herî xweş di van salan de derbas dibe.

Karapêt di sala 1929an de diçe Binxetê (Sûriyê), li Qamişlo bi cîh dibe. Karapêt dibihîze ku Artêşa Fransa li Lejyonan (leşkerên bi pere) digere ji ber ku karek di destê wî de tune, diçe di Artêşa Fransa de dibe Lejyon.

Karapêt di sala 1936an de bi qîzeke Ermen a bi navê Yeva (Hawa) re dizewice. Çar keç û kurek ji zewaca Karapêt û Yevayê çêdibin. Pîreka Karapêt a ku Karapêt pir pir jê hezdikir Yeva Xanım di sala 1976an de wefat dibe. Karapêt bi wefata hevjinê xwe pir diêşe.

Karapêt 15 salan di Artêşa Fransayê de leşkeriyê dibe. Piştî vekişandin a wan ji Sûrî Fransî teklîfa hemwelatîtiya Fransa didine Karapêt, lê ew vê teklîfê qebûl nake.

Xaço bi rêberiya du Rûsên di Artêşa Fransa de ligel hevala xwe Yeva li keştiya Fransî siwar dibin û diçine Ermenistanê û li welatê bav û kalên xwe bicîh

dibin. Ermenên Ermenistanê gelek tadan li Karapêt dikin ku çima ew Ermen e û stranên kurdî dibêje. Sebra Karapêt li nav ermenan nayê. Ji ber ku tadan jî didinê diçe li gundekî binavê Solxosê ku Kurdên Êzîdî jî lê hene bicîh dibe.

Pişt re nav û dengê Karapêt li vir jî berbelav dibe û ev xeber di demeke kurt de digîhîje guhê xebatkarên Radyoya Dengê Êrîvanê. Xebatkarên Radyoya Dengê Êrîvanê ji Karapêt rica dikin ku ew stranên xwe di radyoyê de jî bêje. Karapêt rica xebatkarên Radyoya Dengê Êrîvanê naşikîne û di Radyoya Dengê Êrîvanê dest bi xebatê dike.

Xaço piştî ku di Radyoya Dengê Êrîvanê stranan dibêje, di demeke kurt de dengê wî hema bêjin dikeve mala kurdên Rojhilata Navîn tevan. Karapêt 55 salan di Radyoya Dengê Êrîvanê de dixebite.

Karapêt piştî temenekî tijî êş, jan û nexweşî di sala 2005an de li gundê Solxoza Erîvanê, di 103 saliya xwe de, diçe ser dilovaniya xwe. Xaço di 90 salên jiyana xwe de bi kurdî stran çêkirin û gotin. Di tevahiya jiyana xwe de rastî gelek zehmetiyan hat, bi dehan dengbêj jî gihandin.

1.2. VARYANTA KARAPÊTÊ XAÇO

Hey lo hey lo hey lo hey lo... hey lo hey lo...

Hey lo hey lo hey lo hey lo... Şem rebenê.

Şemê digo: Filîto lawo li maltîka... malê xwe yo...

Daniye li Kaniya Badereşê lawo... seravê yo... Şem rebenê...

Daniye li Kaniya Badereşê lawo... seravê yo...

Dibê: Filîte Quto gelo digere dîsa li xirabiyê o...? Şem rebenê...waê...

Şemê digo: Filîto lawo dilê min ê wê... dil dibê yo...

Ne min go: Lawo neçe pêşiya vî terş û taleşa û terş û talişî gune ne.

Çavê jin û zarokê wan a bi xemî ne. Mane li rê o... lê Şem rebenê...

Hey lo hey lo hey lo hey lo...

Şemê digo: Filîto min go: Lawo karwan hato... ji Bilêderê...

Mamê Elî Etmankî bi sê dengê fikir gazî li xulam û xizmetkara digo:

Bavê kî no? Hûnê bara bi qelêbin. Bikevine berê...

Min ê rojekê dua fikir serê min û Filîte Quto kurê Şemê

Li parava Qêrê dîsa li vê derê... Şem rebenê o...

Şemê digo: Filîto lawo

Min go ji pozê Qîrê heta Delana Paşooo çend neqeb e..?

Di bê mertala bavê Hesên lawo gelo sorî gulkî bi kokev e?

Û herçî şerê bavê Hesên tê de ye;

Daîm qetil xwîn e, wê bi xezeb e... Lê Şem rebenê...

Filîte Quto bi sê dengê fikir gazî li Mamê Elî Etmankî

Digo: lawo hêstira pêşîn hêstira paşîn deyne wê baca rê yo...

Xulam û xizmetkara digo: Gelo gelî xulaman

Hûnê hêstira pêşîn hêstira paşîn bidine Filîte Quto?

Bila bibe qelenê diya xwe yî wî Şemikê o... lê Şem rebenê...wie...

Şemê digo: Filîto lawo roja me derketî... wî ji alê dolê...
Şewq û şemala xwe da pozê Seydim Qasim
Tapiya bir û mertala bavê Hesen, gurkê Donê...
Ji xêra mala Xwedê ra gavê Bavê Hesenî talek û pêşîr tenî
Bira tê biketa çend peyayê mala Hesen Korê...! Şem rebenê...wîu...

Şemê digo: Filîto lawo karwan tamam dibê wê... karwanî ne...
Bira ji Mamê Elî Etmankî pêştir karwan û bazirgana
Li welat û şaristana... ne gerîn e...
Îro derbekê dayê bejn û bala Filîte Quto li bavê Hesenî tal e...
Û koka mêra ji mala wana di tepîne... lê Şemê rebenê...wae...⁶

⁶ Salihê Kevirbirî, **Filîte Quto**, Weşanên Do, 2009, Stenbol, r. 72 - 73



1.3. JÎNENIGARIYA DENG BÊJ RESO

Reso, Resoyê Gopalan, Resoyê Qilîwelo dengbêjekî Kurd e û yek ji şagirtên Evdalê Zeynikê ye.

Reso di sala 1906an da li Îdirê hatiye dinyayê. Bavê wî Welo ji Rewanê hatiye Îdirê. Malbata wî ji mihacirên Elegeza Rewanê (Erîwan) bûye.⁷ Piştî Şerê Cîhanê yê

Yekem Reso tevî êla xwe bar kiriye û hatiye li gundê Qereyaziyê, li Gopalan bicîh bûye.

Reso ji rêza (ekola) Evdalê Zeynikê ye. Reso qet neçûye dibistanê. Di zarokatiya xwe de şivantiyê dike û debara malbata xwe dike. Di wan salên zarokatiya xwe de ji dengbêjekî li herêma Gopalan ê bi navê Dengbêj Sîno dersên dengbêjiyê werdigre û fêrî gotina kilaman dibe.

Reso di xortaniya xwe de hertim ji gundekî koçî gundekî din dike. Reso ji Gopalan diçe gundê Xêrgisê ku bi ser Kopa Mûşê ve ye. Li vê derê dikeve bin bandora şagirtê Evdalê Zeynikê, Ferzê Milazgirî. Ji Ferzê perwerdeya dengbêjiyê girtiye û bi destûra Ferzê bûye dengbêj.

Motîfên di stranên Ferzê, yên li ser jiyana, bawerî, nirx û wêrekiya kurdan de bala Reso dikişinin û ev dibin sedem ku Reso bêhtir bi xwe bawerbe û têkeve nav lêgerinan.

Di stranên Reso de motîfên ku ji bilî wî kesî bikar nedianîn hene. Motîfên ku Reso di stranên xwe de bikartanîn ji her mijarê ne.

Reso helbestvanekî gelekî xurt ê destanan bû. Reso gelek çîrokên gel û destanên mîna Kerr û Kulik, Memê Alan, Cembeliyê Kurê Mirê Hekarî, Siyamend û Xecê jiber dizanîbû û her yek ji van dastanan bi meqamekî taybet dixwend.

Di sala 1930î de Serhildana Agirî dest pêdike. Ji ber ku Reso mirovekî pir welatparêz bû tevî serhildanê bû. Piştî ku serhildan têk çû neçar ma ku weke gelek hevalên xwe biçe Binxetê (Sûriyê). Reso li Binxetê li Qamişloyê bi cîh dibe.

⁷ Azad Zal (Ed.) **Antolojiya Dengbêjan**, Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê (Çapa Duyem), 2011, İstanbul, r. 320

Reso piştî ku ji Qamîşlo vedigere êdî nav û dengê wî zêde bûye û di nav gel de pir hatiye hezkirin.

Kurê Dengbêj Reso, Abdulkerim GÜNER li ser jahrdayina bavê xwe wiha dibêje: “Sala 1969an bû. Gundîyekî me di salên mihaciriyê de koçî Misircê (Kurtalan) kiribû. Jibo sineta kurê xwe hat gundê Pîyongê da ku bavê min wek dengbêj bibe sineta kurê xwe. Bavê min û gelek xelkên me çûn Misircê. Piştî sinetê bavê min dibêje “Ez bi we re nayê. Ezê herim Rihayê, qeza Sûrûcê cem dostekî xwe”. Piştî bavê min diçe cem dostê xwe, du rojan dimîne û hevalê wî dibêje vaye dawetek li ser sînore Surîyê heye, em herin dawetê. Bavê min jî qebûl dike û bi hev re diçin dawetê. Li binê konê dawetê 7 dengbêj her car li ser piya klaman dibêjin û bavê min jî rûniştî klaman dibêje. Lê bavê min wan dide rawestandî. Li binê konê dawetê, hinnê dixin qehweya wî û dengê wî xerab dibe. Ji wir diçe ser doktorên Mêrsînê, Adanayê û Îstenbolê lê jê re çare nabînin.”⁸

Li ser vê bûyerê dengê wî yê oktav bilind û zîz xirab dibe. Dibêjin ku piraniya stranên wî yên hatine tomarkirin bi vî dengê nebaş hatine tomarkirin.

Li gorî dengbêj Zahiro dibêje, plak û kasetên wî yên bi dengê berê hatine tomarkirin niha li cem parlamenterê Mûşê yê dewletê Kazim in û ew jî wan qasetan nade kesên din.

Reso sê caran zewiciye û ji 10an zêdetir zaroyên wî hene. Reso gelek stran li ser jinên xwe çê kirine. Jiyana wî bi giranî li dora Mûş û Erzeromê derbas dibe. Di dawiya emrê xwe de koçî Adapazarı dike ji wir jî koçî Manîsayê dike. Li wan deveran jiyaneke şepirzê derbas dike û paşê sebra wî li wan deran naye û vedigere gundê Pagê yê bi ser navenda Mûşê ve.

Li gunde Pagê ji aliyê hin kesan ve bi keviran tê birindarkirin. Li ser vê bûyerê gelekî aciz dibe û bi nexweşiya pençeşêrê dikeve. Hin hezkiriyên wî, ji bo ku wî ji nexweşiya wî xilaskin wî dibine Enqerê. Mixabin Reso li Enqerê di sala 1983an de jiyana xwe ji dest dide. Heskiriyên wî cenazê wî dibine Pagê û wî li wir di veşêrin. Ev kilama ku ez li jêr pêşkeş dikim di sala 1957an de bi awayekî amatorî hatiye tomar kirin.

⁸ Mahmut BEĞİK, **Dengbêj Resoyê Gopala**, Teza Lisansa Bilind, Zanîngeha Artuklu, Mêrdin, 2015 r. 46

1.4. WARYANTA DENG BÊJ RESO

Ê... Hey loooo... hey lolo, hey lolo, hey lolo Hey lolo, hey.... lolo.

Felîto lawo karwanî berxê min karwanî...

Karwan êvarê barkir çûyiyê bi royê ra qet dananî li Kevanê Kêrê li Kaniya Qîre li Pira Batmanê li Delavê Paşo pêşî veşerîya li ser paşiyê danî...

Lawo tu çîqa xortek nezanî, bi çî aqilî swar bûyî hatî pêşîya vî karwanî..?

Te serê paçê çindare berda ser erwanî.

Law te ne go serkarwanê Eliyê Etmanekî Emê Mamê Gindê ye?

Gava tu cara ji vî cari ji ber destê wan egîtan û xweşmêran xilas bibî...

Lolo Filît lawo bira Şema dayîka te bi bê:

Teze min çokê xwe da erdê ji xwera aniye berxê lawek anî lawooo...wax wae...

Bê heylor heylor, heylor heylor, heylor heylor, heylor heylor...

Lo hey lolooo, wax hey lolooo Şemê bi reben be lawo...waê... waê...wae.

Heylooor, Filîto lawo karwane berxê min karwane...

Min dî Emê bankir go: Elî lawo baharda baran li welatê me nebariye.

Em pê ra mane. Rabe tevdîra karwan bibîn.

Emê berê xwe bidin Mûsilê belkî li pêşîya Welatê me nebe xelaya nane...

Pêşîya karwan Deveye. Lawo ê ortê Hêstirin, li paşiyê ga ne...

Filîto lawo tub çî aqilî hatî pêşîya vî karwanî...?

Çavê kozî û kulfetê karwanan herkes li serê rêyane...

Serkarwanê Eliyê Edmanekî Emê Mamê Gindê ye...Lolo Filît lawo Xwedê zane,

Emê Mamê reş bi tewrê dewra berê ji şîxana milê xwe bi gumane berxê...

Ê h ê ê.. hê ê... waê...waê... ê hiê... hiê... dê bi rebenbe lawo...waê...waê...

Heylooor, Filîto lawo sibe ye. Min dî Filît bang dîkir.

Digo: Elî lawo ez nizamî karwanê we hemû çî û çîye...?

Eli bankir go: Filîto lawo karwanê me hemû sê qîsme:

Qîsmek ga, yek qantir e, lawo yek deve ye...

Li pêşiyê barê devan xurme, ye, di ortêda bare hêstira barût û gulle ye...

Serpaşiyê barê ga ji welatê jêr tîm temam genimê spî ye..

Ez yeqîn dikim, tu ji me di xwazî paç û xeraca serê rê ye...
Ezê li pêşiyê pêşkêşî te bikim meya Xeco, hêstira navê wê Hedo ye...
Lawo eger tu xortekî heyfî, ji malê dunêyê tenikî,
Bira bi eşq û rizayê me ji te ra helal be paç û xeraca serê rê ye...

Îrooo Filît ban dikir digo: Elî lawo derdê min ne Meya Xeco,
Hêstira navê wê Hedo ye... Ew herdu dêr û dêmez malê min in...
Min sondek sond xwariye li ber destê Şîrîna Fille ye.
Yan cinazê min ra dikin ji orta meydanê...
Yan jî lawo gere ez bi destê xwe li ber çoka Şîrîna Fille daynim
Bazinbeleka milê apê tey Mamê... berxê... Ê hê ê.. hê ê... waê...waê
Heylor heylor, heylor heylor, heylor heylor, heylor heylor.....
Wax hey lolooo wax hey lolooo de Şemê bi rebenbe lawo...waê... waê...

Filîtooo... lawo min dî Elî bang kir...
Emê Mamê go: apo tu çi dibê jî bona vê yekê ye?
Pîncê Şemê ji min di xwazê pac û xeraca serê rê ye
Min ji pêşiyê pêşkêş kir meya Xeco, hêstira navê wê Hedo ye...
Îro pê qayîl nabe dibê: Dêr û dêmez ew hertim malê min in.
Derdê min bazinbeleka milê apê tey Mamê, navê wê bûkê ye...
Heya niha serkarwanî di destê te da bû.
Apo kes tu salix neda te dida xelkê pac û xeraca serê rê ye...
Serkarwanî îro ketiye destê min ezê sibê dakevim nava êla Reşkotana, Etmaneka
Xelkê ji min ra nebê kanî Bazinbeleka milê apê te Mamê ye...?
Min dî Emê di go: De lolou...de lo lolo... lolo... hey lolo ...lolo...lolo...wîu wîu
Elî lawo de ciwaba xêrê ji ter ne mîne.Ji xwer bi aqil be!
Gava baldar be. Ne çêkirin û şekirina tuncik û temeliyê ber çavê qîz û bûkane.
Te qet nebihîstiye nav û dengê pîncê Şemê! Law va şerê bokeberana nî wîu... wîu...
Sê sid û şêst û şeş tamarê mêra, ji pišta min rabûne.
Beroxê pirça serê min bû şijûn e.
Tu baz de bazinbelekê tevî gulle barûtê bazinbelekê ji apê xwera bîne...
Ez ji vê sibê da guhê xwe li pîncê Şemê dadigirim.

Xelkê ji mira nebêje kanê bazinbeleka milê apê te yê Mamê ye...?
Gotina di destê mi da ma ezê hînga ji xelkêra bibêjîim.
Ezê bêjim: Min Mamê apê xwe bir Serhedê zewicaaand.
Şema diya Filît jêra xwestiye lawo bi Bazinbeleka ser qelenê Şemê berxê...
Hiê.. hiê...hie...wae...wae....ê hie...hie...hie... hie...waê... waê...

Felîtêê Quto bang dikir go: Elî lawo dilê min dibê ye...
Karwan tê ji Kevrê Badê bajar bi bajar rê bi rê ye...
Lawo derdê min ne meya Xeco, hêstira navê wê Hedo ye...
Siwal bikin nav û dengê Filîtê Quto.
Min ji gelek ra stendiye pac û xeraca serê rê ye...
Tu û Mamê apê xwe lafa nedin xwe li orta meydanê.
Lawo sual bikin, min ji gelek ra stendi ye...Pac û xeraca serê re yê...
Yeqîn hûn bizanibin hun her du ji minra îro yên dawiyê ne berxê...

Min dî Emê di go:Lo lou...lolo...lolo... lolo li lolo...lolo...lolo...wiu wiu wiu.
Filîto lawo Kevanê Qêrê, Kaniya Qîrê, Pira Batmanê, Delavê Paşo bişewite.
Îro bi simaqe û ez ewqas li dunyayê geriyam.
Min kesi nedî bi qasî te nezan û pirî ehmeq e.
Tu bi çi aqilî hatî pêşiya vî karwanî? Heyfa te bi va egît û xweşmêran nayê lawo...
Îro sê dan û sê şeve temamê teyrûka danîne ser cinazê va egîtan.
Xwîna wan ji xwera dixwin waqe waqe...
Eger tu xortekî be çê dil û can û bi cîger be xwe welecî!
Were ez û tu va bi desthevda sond bixwin.Lawo xelk gunê ne.
Cerba xwe li kozî û kulfetê kesî naxin,
Bira çavê kozî û kulfetê kesî li rêya nemîne. Lawo ji min û te îro li meydanê.
Kî bireve ji wan berdayî be sê telaq e. Berxê...ê hiê...ê hiê.. dê bi rebene lawooo.

Îrooo... Emê bankir go: Elî lawo Kevanê Qêrê, Kaniya Qîrê, Pira Batmanê li vî tahtîî
Gulle û barûda bazinbeleka destê apê te xelas bû.
Bazinbelek di destê min da bû qatîî, xwe bi ser bare Hedo ra bi gîhine.
Gulle û barûtê bazinbelekê ji ser barê Hedo ji min ra bîne...

Ezê îro gulle barûda têj bikim iro pîncê Şemê îsal çend û çend sale...
Lolo Elî lawo pîncê Şemê bûye êrmelikê vî welatî berxê...
Hiê... hiê...hiê...hiê wae.. wae.... ê hiê... hiê...dê bi rebene lawooo...wae ...wae.

Îrooo...Filîto lawo karwanî berxê min karwanî...
Karwan êvarê barkir çûye bi ro yê ra.Qet da nanî.
Qevanê Kêrê,li Kaniya Qîre, li Pira Batmanê,
Li Delavê Paşo pêşî vegeriya li ser paşiyê danîî,
Tu bi çi aqilî hatî pêşiya vî karwanî? Te serê paçê çindare, berda ser erwanî...
Te negoo îro karwanîne berxê heger çavê kozî û kulfetê wan li rêne bira li rê nemîne.
Sed yazixa Filîte Quto xortekî heyfe nazikî nazenîn e.
Ev canê Filîte delalî li meydana Emê Mamê Gindê,
Îro bi sê gullê bazinbelekê bû birîne berxê...
Min dî Şema diya Filît derkete banê qesrê, bang dikir digo:
De lolooo, hey lolo hey lolo, wey lolou..... Filîto lawoo way e. way e. way...

Îro law Filîto lawo Xwedê xira bike Kevanê Qêrê,
Kaniya Qîrê, Pira Batmanê, Delavê Paşo bişewite,bi kizire lawo...
Qe nehate bîra min e dayîka te ji tera bibê neçe pêşiya wî karwanî.
Lawoo Xwedê dizane serkarwanê Eliyê Edmanekî Emê Mame Gindê...
Tivinga di destê Mamê Gindê de malê Romê, berê sê bazine berxê,
Canê Filîte min ê delalî li meydana vî xweşmêrî bi sê gullê bazinbelekê bûye birîn...
Filît lawo eger tu li meydana vî xweşmêrî bi hersê gullê bazinbelekê tu ax bibêjîî.
Gelî cimeta hingê Xwedê dizane hinga hun bizanibin Filît pînce ne ji mine berxê...
Hiê...hiê...hiê... hiê...wae... wîu...ê..hie...hiê..lo dê bi rebene lawooo...wae.. wae.
Bê heylor, heylor, heylor heylor, heylor heylor, heylor heylor.....
Îro law Filîto bêşîro, lolo telefoo.. karwanîne law kesîreye....wae... wae...⁹

⁹ Stran ji vê lînkê (xelekê) hatiye deşifrekirin: <https://www.youtube.com/watch?v=COKNW3mKnPU>

1.5. JÎNENIGARIYA DENG BÊJ NESOYÊ AGIRÎ

Dengbêj Nesoyê Agirî ji gundê Zado ye. Gundê Zado biser navenda Agiriyê ve ye. Navê dengbêj Neso yê rastîn Nusret e. Dengbêj Neso di sala 1932an de li gundê Zado jidayik dibe. Dengbêj Neso di zaroktiya xwe de qet naçe dibistane. Lê paşê fêrî xwendin û nivisandinê dibe.

Li gund debara xwe bi karên çandinî û ajalvaniyê dike. Jiyana Dengbêj Neso bi giştî li gundê Zado derbas dibe. Tenê di sala 1968an de diçe Edenê li wir sê, çar salan dimîne paşê dîsa vedigere Zado û heya dawiya jiyana xwe li Zado dijî. Dengbêj Neso bavê 2 kur û 4 qîzan e.

Dengbêj Neso ji nasekî xwe yê bi navê **Feqiyê Mihê Qaso** fêrî dengbêjiyê dibe. Dengbêj Neso herî zêde dibin bandora Dengbêj Evdalê Zeynikê de dimîne. Ji ber ku Dengbêj Neso ji feqiyekî fêrî dengbêjiyê dibe di berhemên Neso de motifên olî berbiçavin. Piştî ku Dengbêj Neso binav û deng dibe êdi di odayên gundan de hertim dibe mêvan û stranên xwe li gundên herêma Agiriyê û derdora wê dibêje. Dengbêj Neso di sala 1998an de li gundê Zado diçe ser dilovaniya xwe.

Li gor ku kurê Dengbêj Neso, Burhan SÖĞÜT dibêje:

“Di salên ku Kurdî qedexe de, dengbêj Neso carekê kîsek qasetên xwe yên ku bi amatorî dagirtibûn, di bin erde de vedişêre û paşê biser wan qasetan ve nabe û gelek qasetên wi nagîhijîn roja me. Disa kurê dengbêj Neso, Burhan SÖĞÜT dibêje ku gelek qasetên bavê wî li cem hevalên wî ne û wan qasetan nadine wî jî.”¹⁰

¹⁰ Agahiyên di derbarê jiyana Dengbêj Neso, ji kurê wî, **Burhan SÖĞÜT**ê 62 salî hatine wergirtin.

1.6. WARYANTA NESOYÊ AGIRÎ

Ax hey looor... heylor... heylor..... heylooor... hey loêêê..hey lolo lawoo...ê hê... ê.

Ma Filîtooo... lawo bihare, çiyayên me xweş zozan e.

Filîto lawo bihare çiyayên me xweş zozan e.

Li nava... Êla Etmanka bû qetta barane; xela ya nan e.

Lê Emê Etmankî; gîşeyekî xortan e. Hûsnê li Emê heye, tine li ti lawê bavan e.

Der û dîtina Emê Etmankî li memleketa li welatan e.

Xwedêyo ti evî zilamî hafiz bikî ji nezera qencan e, xiraban e.

Emê wê salê dêna xwe da dergistiyê, şeş mehan e.

Elî û Mamê Gindê dikin karê zilama, tevdîra karwan e.

Emê ciwabek şande konê xezûrê xwe, cem dergistiya xwe, bi qaide û usulê eşîran e.

Di go: Mal şewitiyê em diçine evê karwaniya han e!

Lê mi navê, li qarşê heval û hogira der û cîrana ji ber odê,

Werme dîtina te, ji şerman e.

De nîvê şevê, ji binê konê erebî rabe ji xewê, li nava dîwana û bînan e.

Xwe bide ber perde û çîtan e. Em ê serenda vekin, gazincan û loman e.

Heyamê dilooo... dil xatirane lawo... wae... wae...ê...hê....hê.... êw.

De heyla... dergistiya... Emê gava hilda evê xebera han e.

Nîvê şevê rabû ji xewê, nava cilvelerînan e. Xwe dida ber perde û çîtan e.

Ew û Emê Etmankî runîştin ketine xeberdanê, mijûliyan e.

Lê eman gidî wextekî, em giş cahil bûn, mîna wa na, me derbaskir,

Evan sal û zeman û wextan e. Le Emê wextekî... serê xwe bilind kir,

Aliyê şefeqê, bala xwe daye asîman e.

Nihêrî stêrka karwanqirê bilind bûye bi sê rîman e.

Dengê banga erebî tê, ji serê minaran e.

Lê dengê mamê wî tê, dike karê zilama, tevdîra karwan e.

Emê go: Here mal şewitiyê! Ez û ti çi qas mijûl bûn?

Eva şeva han çi zû derbas bû, çi ve zelal bû? Lê malmiratê!

Ema dengê mamê min tê, dike karê zilama, tevdîra karwan e.

Em diçine Deştê Heranê, Beriya Siruçê, Xeta Helebê di berda ne.

Ji te re çi lazime ji xeml û giradanê cahilane? Lê li min bike tembîh û wesiyetan e.

Bi xêr û şahî, ji vê karwaniyê vegerin, werne malê, mîna berê, fenanî caran e.
Bira heval, hogir, der û cîran li te nexin ta'nê giran e.
Bira nebêjin, Emê ji devê Xeta Helebê, ser te de vegeriya dest valan e.
Li min bike tembîh û wesiyeta heyamê...diloêêê...dil û xatirane lawoo waê... hê...ê

Heylooor... heylor... heylor... heylooor...hey loêêê..hey lolo lawoo...ê hê...hê... êw.
Lê dergistiya... Emê gava jê hilda evê xebera han e.
Go: Emê Xwedê min li dora serê te bêkê qurban e!
Hûsnê li te heye, tune li ti lawê bavan e. Têne dîtina te ji memleketa welatan e.
Ez nizamim, li te ketiye nezerê çavan e.
Lê li hêla me bûye qetaa baranê, xelaya nan e.
Lê daye li pêşiya we zilama, evê karwaniya han e.
Biner lazime xeml û girêdanê cahilan e.
Lê de were, eve karwaniya ha bibe sebabê me her du cahilan e!
Nehêle, mîna îro li dînyayê, em hevdû bibînin bi çavan e.
Lê nehêle, me qetînin kûla miraza, jê nexwar li gel heval û...hogirane lawoeê hê...ê.

De heylooor... heylor... heylor..... heylooor...heylooor.
Le gava... Emê, go ji dergistiya xwe hilda, evê xebera han e.
Go: Mal şewitiyê, ji dilê xwe bavê evan niyetan e!
Te qey guhê xwe nedaye, gotinê şexan û melane?
Emrê Xwedê hat, sebab jî pê ra tê, di bê mehnan e.
Qulê go hatiye ru dinyayê, wê rojekê li qebrê bibe mêhvan e.
Li min bike tembîh û wasiyeta, heyamê diloêêêy... wê... û xatirane lawoo...

Ma heylooor... heylor... heylor.....heylooor...heylooor.
Lê eman... dergistiya Emê, gava jê hilda vê xebera han e.
Go: Emê... xeberê mezina tecrûbe ne, ji berê da gotinê pêşiyane.
“Malê dinyayê hûsne insanî”
Li ber serê me va ecelekî, me elaqe ji, berê da dijminekî giran e.
Le ti bidî xatirê Xwedê û pêxemberan e.

Le heman gidî tû yê biçî evê karwaniya han e.
 Tê bi xwe re, nebî xeml û girêdana xwe ya xortan e.
 Bi vî qed û qametî, bejna xwe nedî ber gûlekane, gûlbendan e.
 Ji kerwanê xwe ne qetî, Bi vî qed û qametî, bi xeml û girêdana cahiliye,
 Neçî nava ti êla, gûndane, domane!
 Heçî qîz û bukê bi vî qed û qametî, bi vî hûsnî, bi vê giredanê te bibinê bi çavane,
 Ti bibê melayiketê Xwedê, peyabê erdê ji asîmane,
 Ti xwe xelas nakî ji nava dev û diran e!
 Wê li pey te bêxin qûr û bêbextiyê giran e.
 Lo mal şewitiyo, xeberê mezina tecrûbeye ji berê de gotinê pêşiyane e.
“Kesî nedî, bi serê çê heya axiriya emir, bi hevdu re kal û pîrbûn”
 Çûyîna ser dû yastixan û balgiyan e.
 Ti ne lazimê, xeml û girêdanê.... cahilane lawoêê... ê...hê....êw.

Ma heylooor... heylor... heylor... heylooor... heyloooooor.
 Lê eman Emê gava hilda evê xebera han e.
 Go: Mal şewitiyê... mirin bi xwêdê ye, ne bi destê ‘evdan e!
 Vê sibiha ezîz, vekiriye, derê dergahê xêran e. Ji dilê xwe bavêje eva niyetan e.
 Lê li min bike, tembîh û wesiyetan e.
 Dengê mamê min tê, dike karê zilama, tevdîra karvan e.
 Lê eman dilê mi neşikîne, vê sibê li ser vê oxira han e.
 Dergistiya Emê, gava eman gidî, go ji Emê hildaye vê pirsê han e.
 Go: Emeyo diçe, Deştê Haranê, Beriya Sirûçê, Xeta Helebê di berdan e.
 Lê tê ji minra bîne, Meya Mendena, Kevoka Kedî, Nesxoraçiyê Memoryan e.
 Lo Bisqê Beyrudê, Şara Keskerewanê, karwaziyê cahilan e. Tîne bi zêr kevnan e.
 Hedinê wî Ermuşê Helebê badane, bendek zerî Kodikê Herînî, pêde dadan e.
 Lê gava li hevdu kirin tembîh û wesiyeta,
 Herdu cahil bihevdu re, ji erdê rabûne piyan e.
 Destê xwe li hevdu xistin, xatir xwestin ji hevdu qetiyane e.
 Wexta Emê berê xwe da, derê malê nava karwan e.
 Dergistiya wî, berê xwe da dergahê Rebê Âlemê
 Lê digo: Xaliqo, Rabiyo ti li wan werê rehmê, li eva tengaziyanê, rê li rê û dirban e.

Niyeta cemî'e misilmanan e. De serê li ser balgiyane, qalaya binê kirêtan e.
Vê sibihê ti hema qabûlke, bê niyeta me çiyê!
Kekê Emê, bi xêr û şahî vegefîne, ji vê karwaniya han e.
Lê dilê mi wisa di şewite, ez xwe nagirim li ser darê lingan e.
De Wellâh, wa karwaniya bibe sebebê me herdû cahilan e.
Nehêle, vegefîne kûla miraza, jê nexwar li gel heval û hogirane lawoêêê... hê...ê.

Ma heylooor... heylor... heylor..... heyloor...heylooor.
Lê Emê... di hate derê malê nava karwan e.Di çû alî koninê wan an e.
Hêl dida, xeml û girêdana xwe ye xortan e, di xiste nava desmal û boxçan e.
Di da ser, barê hêstiran û dewan e. Ji êlê bi rê ket, karwanê Etmankan e.
Çend roja ajotin bê dan, bê nan e. Rojek ji rojê Rabbê alemê, mîrê mîran e.
Derketine Deştâ Haranê, Beriya Sirucê, mije bi dûman e.
Lê bala xwe danê, danîne êlê Berrêzan e.
Derketine xelmanê nan e. Genim zaf e. Ceh erzan e?
Lê koda genim dikirin, zêrekî bi sê mecîdiyan e.
Dikirin kar û barêê...di karwan e. lawoêêê... hê...ê.

Ma heylooor... heylor... heylor..... heyloor...heylooor.
Lê wexta dikirin, kar û barê karwan e.
Lê, Emê dani peşiya xwe, boxçê girêdana xwe ye xortan e.
Bi wî qed û qameti, bi wî hûsnî bejna xwe nave, gulekê gulbendan e.
Lê her çend hevalê bi çavê xwe ra hildan e,ji bona tembîh û wesiyetê cahilan e.
Kete nava Sirucê, çarşî û bazaran e.
Lê mîletê Sirucê, heçî kesê Emê di dît, dizanîbû xerîbe, ne xelkê van deran e.
Xweyê dikan û mexazelerê, dikan û mexazê xwe dadan e.
Lê qîzan û bukan, xwe dan ser bircan û banan e.
Li pey Emê, mîletê Sirucê dikişê,mîna mijê, fenanî dûman e.
Lê qed û qamet, hûsnê Emê nexşê xwedêye, ne çêkirina ti qûlan e.
Pezê nîvro hatiye danan e.Li derê malan karîne miyan e.
Li koza koma zarinîne berxan e. Aqîne dergûşan darê beşîgan e.
Kes na nêre, li ra û tevdîra malan e. Xwe dane ser bircane, banan e.

Di nêrin li bejna vi zilamê han e. Xwêdêyo ti evî zilamê hafiz kî,
Ji nezera, qencane xiraban e. Lê li dergistiya wî herimiye, xewê şevan e.
De çavê wê maye li welatê xerîbiyê, li rê... û...li dirbane lawoêêê...hê...ê.

De heylooor... heylor... heylor.....heyloor...heylooor.

Lê de wê... Emê..hevalê wî pêran e. Çavê xwe digerîne li xeml û girêdanê cahilan e.
Hat, bala xwe daye, cotek şexxane bi derê mexazekêde bi dardan e.

Xweyê mexazê emrê wî çuye heftê, heştê salan e.

Lê Emê, selam dayê bi qaîde û usûlê eşîran e.

Lê go: Mamo, eman gidî!Fiyetê van şexxanê te bi çendan e?

Xweyê mexazê go: Îca eman gidî! Bi yaşê xwe ji pêşîya Emê rabû piyan e.

Lê go: Lawo, te ez kuştîme ji bo evê xebera han e.

Ti zilamkî xerîbî , girêdana te, ne ya van deran e.

Lê ti korî, îşîyeqê çavan e, li pey xwe na nêrî li vê mija han e?

Cahilan xwe dane ser bircane, banan e. Lê ti natirsî ji Xwedê û pêxemberan e?

Ti bi vî qed û qametî bi vê girêdanê çawa digerî li ber çavê qencan û xiraban e?

Lê bi vî emrê ha, bi xwe gotiye: Ez nikarim bi nezera çavan e.

Lawo ti xerîbî girêdana te ne ya van deran e.

Lê ti bi çi sêrî, bi çi meqsedê hatiye vî welatî?

Derdê xwe bêje ji minra, bi êxe beyan e.

Lê îro li konê apê xwe, bibe mêhvan bi usûla eşîran e.

Ez sond dixûm, bi berdanê pîreka, diçine malê bava, nayêne ra û tevdîran e.

Lê ti derdê xwe ji min ra bêjî, ezê bidime oxira te serê çolix û çoçixan e.

Lê bi vê girêdanê negere li ber çavê qencêê û... xirabane lawoêêê...hê...ê.

Ma heylooor... heylor... heylor..... heyloor...heylooor.

Emê, ji xweyê mexazê hildaye evê xebera han e.

Go: Mamo, ew qûlê hatiye, ruyê dinyayê wê rojekê,axir sonê li qebrê bibê mêhvan e.

Mirin bi xwêdeye, ne bi destê 'evdan e. Xebera têra tine ji berçîyan e.

Li cahila herimiye xewê şevan e. Çavê buka maye li rê û dirban e.

Ne wextê wan gilî gotin û mijûliyan e. Ji minra bêje fiyetê şexxanê te bi çendan e?

Em sîh zilamin, panzdehê me bi şeşxane, panzdehê me dest valan e.
Karwanê me karwanekî girane,
Lê hatin çuyîna me,riya bîst û yek şevane lawoo...ê...hê..

Lê Emê.... heylooor... heylor... heylor..... heylooor...hey lolo.

Lê di go: Lê mamô bêje fiyetê bazinbelekê te bi çendan e?

Xweyê mexazê eman, gava hilda evê xebera han e.

Go: Lawo li min herambê, navim qûrûş û deh peran e.

Ji xwera şeşxanê hilde, badilhewan e.

Emê gava hilda evê xebera han e. Lê go: Mamô, em tobedarin,

Ji berêde wesiyeta bavane, kalane, Em hejayê ti camêra hilnadin, badilhewan e.

Hê bêje fiyetê şeşxanê te bi çendan e?

Xweyê mexazê go: Lawo ez sond dixum bi Rebbê alemê,

Bi berdanê pîreka, diçine malê bava, ji xwere nayêne , ser ra û tevdîran e.

Lê lawo, eman gidî! Lê bi dûsed zêrê madenî semyan e.

Ezê bidime te bi çil û çar zêran e.Ezê bi şertekî,

Serjêrî ji bona wesiyeta bav û kalê te, hema zerar bikim ji semyan e.

Lê ne wextê wan gilî û gotin û... mijûliyane lawoêêê... ê...hê....êw.

Ax! Heylooor... heylor... heylor..... heylooor...hey lolo.

Lê Emê, gava hilda evê xebera han e.

Dest avête binê Eba Hezroyî, mîratê enyane (berîk)

Çil û çar zêra, da xweyê mexazê.

Şeşxane li ser girêdana cahiliyê, li navênê orta herdû milan e.

Le hevalê wi pêre, xatirê xwe xwest, derketibûn dervan e.

Xwediyê dikan û mexazelere dikan û mexazê xwe dadan e.

Qîzan û bûkan, xwe daye ser bircane, banan e.

Lê milletê Sirucê, li pey vî zilamî dikişê, mîna mijê, fenanî dûman e.

Xwedêyo werê rehmê, nefsa tengaziyan e.

Serê li ser balgiya, rêwiyê li rê û dirbane, niyeta cemî'ê Misilmanan e.

Çavê dergistiya Emê, maye li rê û dirba,

Lê herimiye xewê...li şevane. Lawoêêê... ê...hê....êw.

Heylooor... heylor... heylor..... heylooor...hey lolo.

Emê, gava şeşxane avête, orta herdû mila, ji mexazê derkete derve, hevalê wî pêran e.

Lê, Mamê Gindê, apê Emê, emrê wî digihijê heştê, nihwêt salan e.

Çarbihostka daye cotê biriyane, kûrkê xwe avêtiye orta herdû milan e.

Agir berdaye qelunê, pala xwe daye hêlwêrtê devan e.

Lê wextekî, bala xwe dayê, Emê tê hevalê wî pêran e.

Lê piçûk û mezin, rabûne ser bejnane, banan e.

Mamê bêrikê 'erif re dike malûm li berxe xwe, kire gazî bi sê dengane.

Di go: Heylooor... heylor... heylor..... heylooor...hey lolo.

Emo lawo, xema dilê apê te giran e.

Lawo derdê min, ne qirbûna Êla Etmankan e.

Ne kûştina me, koma zilamane, ne belavkirina karwan e.

Lê derde min, ew derde; çavê bûka min maye li rê û dirban e

Lê herimiye xewê şevan e.

Ez te bi silametî ku nebime malê, mina berê fenanî carane,

Ez ê li qarşê heval, hogira çi ciwabê esîhetekê bidim, mirin ji minra çêtir e.

Serê min ranabê, li cem emsalan e.

Lawo ti çawa bi vê girêdanê digêrê, li ber çavê qencane xiraban e?

Li pey xwe nanêrî, li vê mija han e.

Lê Emê sekiniye li ser darê linga, guhê xwe didê, gotinê mame xwe

Li ser darê piya, hevalê wî pêran e.

Le Mame go: Heylooor... heylor... heylooor...hey lo law ê...hê....êw.

Lê Mamê... lê sekiniye, li nava karwan e.

Nihêrî, biraziyê wî sekiniye li ser darê linga, serê wî di berdan e.

Şeşxanek avêtiye, orta herdû milan e.

Lê li Çilodarekî kire gazî, rakire piyane. Bist û yek zêrî dabû destan e.

Go: Lawo, ez bala xwe didime berxe xwe, Şeşxanekê kiriye,

Ser girêdana cahiliyê de avêtiye orta herdû milan e.

Ez dizanim, şeşxanê di aniyana wî de, nehiştiye navê quruşê deh peran e.

Erê ruyê wî nagirê li me, qarşê heval hogira ji min bixwazê, xerçlixê ji şerman e.
Lawo em jî wextekî, cahilbûn mîna wan e.
Me derbaskir, evan sal û zeman û wextê han e.
Niha, bûka min lê kiriye tembîh û wesiyetan e.
Ruyê wî nagirê, xerçlixê bi xwazê ji şermane, serê wî di berdan e.
Ez dinêrim, li xemlê cahila di nêrê, li bin çavan e.
Reyî (rahêje) bist û yek zêrê hanê, here bide destan e.
Bela bi ser bûka min de, venegerê... dest valane, lawoêêê... ê...hê...ê.

Heylooor... heylor... heylooor...hey looêêê hey lolaw ê...hê...ê.
Lê çilo dar, rabû ser darê lingane, lê hilda bîst û yek zêran e.
Hate cem Emê, ker û lal dabû desta, kesî nedî bi çavan e.
Mamê di nêrî, lê biraziyê wî navê li qarşê wî, ji şerma bazar bikê xemlê cahilan e.
Lê Mamê lê dinêrê ji dûrvan e. Piştî xwe pêdakir (berê xwe guhert),
Pala xwe da hêwertê devan e. Agir berdaye qelûnê,
Çarbihostka*(çarik, sitareke ji kumaşê tenik ku meriv ji rojê di parêzê) daye çatiye
biriyan e. Lê Emê, dikete nava çarşî û bazaran e.
Lê dikirî, Meya Mendela, (Mehîna berî), Kevoka Kedî, Noşxeraçiyê Memolyane
Lo Bisqê (misk, an jî ristik) Beyrûdê, Şara Keskerexanê, Çarbostkê cahilane
Lê zivê bizêr kildane, hedînê wî Hermuşê (hevrişim) Helebê badan e.
Bennik zêrê, Kodikê Herînî pêde danan e. Lê, di xiste nava destmal û boxçan e.
Xatirê xwe xwest, ji canik û camêran e. Hevalê xwe hilda,
Berê xwe dabû... nav karwan e. lawoêêê... ê...hê...ê.

Heylooor... heylor... heylor.....heylooor... hey loêêê..hey lolo lawoo...ê hê êw.
Lê Emê, wexta berê xwe dabû nava karwane;
Lê, miletê Siruçê ji piçûk û mezina, ji qîzan û bûka, kalepîra temama
Bi hevdûra destê xwe bilind kirin, ji Rebê Alemê ra dûa kirin bi hevran e.
Go: Xaliqo, Rabiyo ti hasilke niyeta cemî'ê misilmanan e.
Lê, ti salê carekê têxê nava Êla Etmanka qetta baranê xelaya nan e.
Eva zilamê hanê, karwanê xwe hildê, salê carekê were, vî welatê han e.
Ehda mêra li canê me ketibê, li me heram bê.

Kesek jê nestînê, ema qûrûşê deh peran e.
Bila dîtina wî di dilê me de nebê xewneke şevan e.
Nebê xatema*(mohra) siltan Sileyman e.
Lê eman gidî eva zilamê hanê, xerîb bû girêdana wî ne ya van deran e.
Xwedêyo lê were rehmê, li nefsa tengaziyan e.
Lê, ti bi silametî ewî bigihîne nava Êla Etmankan e.
Ji bona vî zilamî, çavê dê û bava, gelek cahila maye, li rê û dirban e. lawoêê..hêe..

Ma Heyloor... heylor... heylor.... heyloor... hey lo lawoê...ê.
Lê ema, Emê di hate nava karwan e.
Mamê Gindê, kire gazî li çilodarane, lê barkirin hêstiran û devan e.
Bi rê ket, karwanê Etmankan e. Lê sîh zilamin; panzdehê wan bi şeşxane ne,
Panzdehê wan destvalan e. Çend roja ajotin bê dan, bê nan e.
Rojek ji roja, Rabbê Alemê, mirê mîran e.
Lo, li zilama ketiye xewê şevan e. Rehet nemaye bi heft heban e.
Lê, Êla wan a, ma riya qonaxekî, dûdan e.
Berê sibêye, dengê banga Erebi, tê ji serê minaran e.
Lê nihêrî eman, bihare wextê zozanan e.
Lê, Êla Reşkota daniye li serê newal... û di mesîrane lawoêê...ê... hê êw.

De Heyloor... heylor... heylor.... heyloor... hey loêê hey lolo.
Lê eman... Êla Reşkota daniye serê newal û mesîran e.
Emê, ajote cem mamê xwe, selav dayê li peşiya karwan e.
Go: Mamo, iro çendê me temam bû, li wê karwaniya han e.
Lê dilêmin vê sibê dişewitê, ji bona çelqemek qatixê miyan e.
Tê izna mi bidî, ez herme nava Êla Reşkotane,
Çelqemekî vergerîne, ser qeytanê lêvan e?
Ezê ecele vegerim... ji parane lawoêê...ê... hê...ê.

Mamê... gava hildaye evê xeberê,
Go: Heyloor... heylor... heylor.... heyloor... hey lo lawoê.
Lê go: Erê, Emê lawo, Xwedê min li dora serê te, bike qurban e.

Lawo, Welleh eman gidî, Êla me maye riya qonaxekî, nakişînê dûdan e.
Lawo ti were, berê xwe nede nava Êla Reşkotane
Filitê Quto toximê Êzîdiyan e. (Axayê Êzîdiyan û Reşkotana)
Li rêwî û gelek cara li bazirgana digêrê li mehnan e.
Ti nasnakê, konê qencane xiraban e.
Lawo, heger dilê te zaf dişewitê; ji bona çelqemek qatixê miya,
De were hespê xwe, bi şivan û qamçiyên e.
Hê, berê xwe bide êla me, malê û konan e.
Lawo daha paş li me nayê, li rê eman karwaniyê, Li vê rêwîtiya han e.
Dest bikişîne ji vê... yeka han e. Lawoêê...ê... hê...êw.

Emê... Go: Mamo go, ne wextê van gilê gotin û mijûliyan e.
Lê ez naçim ji bona çelqemekî, mal bi mal li nava Êlê nagerim, li derê konan e.
Lê, sibe zuye xeyrî kalepîra ji bona nimêjê.
Kes hê ranebûye ji xewê ji nav cilwelerînanan.
Ehda mêra li canê mi ketibê, eger ez li konê ti camêra nebime mêhvan e.
Lingê xwe dernaxim ji zengiyên e.
Ezê ecele vegerim... ji paran e. Lawoêê...ê...hê...ê.

Dê Mamê... go: Li min...li min...li min... li min...
Cahilî ketin e. Mirin nêzîke lawoêê...
Mamê... di go: Emê lawo, eman xema dilê mamê te giran e.
Lawo, ti guhê xwe bide gotinê mamê xwe, qedêrê çend deqan e.
Ti nasnakî, konê qencane, xirabane, dost û dijminan e.
Lê lawo, Almas Xanim heye, kulfeta Îsayê Qarakêçî
Li Binêxetê, par van çaxa Îsayê Qarakêçî, hate kuştinê li doza nan e.
Lê bi destê lawê Şehîn Begê, Bozan û Hirço
Mala xwe, ji binê xettê barkir, hate evî welatê han e.
Lê lawo, danî li pêşiya mala kûrapê xwe Filitê Quto, Êla reşkotan e.
Lawo, hê go em nehatibûne evê karwaniya han e.
Filitê Quto çend rusipî yê xwe şandine konê Almasê
Bi emrê Xwedê û pêxembera, usûlê eşîran e.

Gotiye: Xwedê sola wî daniye, gotina wî çuyî ye.

Bila ji min re bê êxin beyân e.

Lê lawo, Almasê bi serde şandiye evê xebera han e.

Gotiye: Wî bihîstiyê merê min par van çaxan li Binêxetê

Hate kuştinê, bi destê lawê Şehîn Begê, li doza nan e.

Roja mirinê eman gidî! Îsayê Qarakêçî

Emniyet nedikir bida destê yê mîna Filît, serê kihêlan e.

Wî bihîstiyê, Xwedê sola min danî ye, axiriya ‘emr e.

Ez ji kihêla peya bûme, siyar nabim... li gûhdirêjan e. Lawoêê...ê...hê...ê.

Ax heylooor... heylor... heylor.....heylooor... hey loêêê...

Felek berê gûheriyê lawoêê...ê...hê...ê.

Lê lawo... Filîtê Quto wexta ji Almasê hildaye evê xebera han e.

Lê gotiye: Qey li vî welatî, bêhna camêriyek li ti lawê bava nayê, zilam qeliyan e?

Lawo sond xwariye, ji wê rojê, heya evê roja han e.

Heçî, kurê bavan eman gidî! Go bi Almasê re bikevê xeberdanê, mijûliyan e.

Lê ew dibe kihêl, ez dikevime şûna gûhdirêjan e. Sund xwariye, bi berdanê pîrekan e.

Lê, sê jinê wî hene, hîlbijartiyê ji nava sê hezar hefsed malê Reşkotan e.

Lê lawo, eman gidî li camêra li rêwiya digêrê li mehnan e.

Ti nasnakê, konê qencane, xiraban e.

Ti birra mamê xwe dikê, were neçe nava Êla Reşkotane!

Ti were, nezerê li te ketibê ti xwe şaş bikî herî derê, kone evê dêla han e.

Tê bî sebebê, me komê zilaman e.

Wê stûyê bûka min, xwar bibê li bal heval û hogiran e.

Lê felek ne hêle, bi qetîne kûlaê... ti mirazan e. Lawoêê... êw.

Ma Heylooor... heylor... heylor.... heylooor... hey lo lawoêê...ê.

Emê di go: Mamo xema dilê min giran e. Ne wextê van gilî û gotinan e.

Lê Mamê, ti çare ji Emê nedî. Emê xatirê xwe xwest, qetiyê ji karwan e.

Berê xwe da, Êla Reşkotane, lê teqdîrê Xwedê xerîbe, kes nizan e.

Lê Almas, xeyîdiye ji Filîtê Qûto. Konê xwe li perê êlê, tek vegirtiye ji dûrvan e.

Emê go: Ez naçim ji bona çelqemekî, mal bi mal nagerim, li nava êlê derê konan e.

Ezê herme, derê vî konê tek î han e. Ezê ecele vegerim...ji paran e. Lawoê êhê ...ê.

Hey lê li min,.. li min... li min..... li min... wayêêê....

Emê... gava ajote derê kon, konê Almasê, dabû dizgînan e.

Lê şefeqê, Almasê rabuyi melançiya qenterê deva birî û

Leça keriya miya vekiriye, ji guhê riya û taxan e.

Lê eman, kembereke zîvê li piştêye. Xencereke zêrîne di berdan e.

Lê nihêrî, zilamek li derê konê wê daye dizgîna, sekiniye li ser zengiyane.

Agirê kûlê, bikeve bejna bavê vî zilamê han e.

Aniyeke kole gewre lê ye, mîna hîva çardan e.

Sûrete sore, mîna heba hinar e. Lê cavê wî, mîna stêrka karwanqîran e.

Simbêleke reşe tenike, li ber lêvan e.

Almas, wexta Emê bi wê girêdana cahiliye bi wî qed û qametî, dîtiye bi çavan e.

Rebî, destê xwe avête cotê dizgînan e.

Lê go: Bira ez lê dinêrim, li te ketiye xewê şevan e. Rengê te zer bûye.

Birawo mere derê konê camera, wa axir ti nasekinê, li ser zengiyane.

Peyawo, li konê xwanga xwe, iro bi usûlê eşîra...ey...bibe mêhvan e.Lawoêê...ê...ê.

Hê Heyloor... heylor... heylor... hey looêêê mirin nêzîke lawoêê... ê...ê...êw.

Lê Emê... go: Xwangê xebera kesî, ji kesî tine.

Li cahila herimiye xewê şeva, cavê wan mayiye li rê û dirban e.

Almasê nihêrî, Emê li konê wê nabe mehvane, Emê cahil e,

Aqilê wî avêti ye. Ji xwe re kismetan e. Lê bi Emê re ketiye xeberdanê, mijûliyan e.

Hûn tên ji Deşta Haranê, Beriya Sirûcê we yê koda genim anî bi çendan e?

Emê dixapîne, pêra mijûl bû heya ro bilind bû...bi sê rîman e.Lawoêê... ê...ê...êw.

Lê di bê: Heyloor... heylor... heylor...hey looêêê hey lo lawoêê... ê...ê...êw.

Lê...heya roj bilind bû, bi sê rîman e.Qîz û bukê Reşkotî, derketine ji nava heywan e.

Satilê xwe hildane, berjêr bi ser kaniya binya êlê de meşiyane.

Nihêrîn, zilamekî daye dizgînê, sekiniye li ser zengiyane.

Almas pêre ketiye, xeberdanê, mijûliyan e.

Pîrekê Reşkotî, li ser hevda vegeriyan e.
Lê go: Wele eva zilama xerîb e. Eman ne xelkê van deran e!
Go Almas pêre ketiye, xeberdanê, mijûliyan e.
Em herin, em ha binêrin ew kiye, bibînin bi çavan e.
Qîz û bukê Reşkotî, heçî kesê dihat Emê, bi wî hûsnî,
Bi wê girêdana cahiliyê, li ser pişta kihêlê dîtine bi çavan e.
Ji bîra wan diçû ra û tevdîra malan e. Satilê xwe ji milê xwe berdan e.
Gelekê wan, xwe ji bîrakirin, satilê xwe vala hildan, ser malê xweda vegeriyan e.
Lê Emê, ketiye xeberdanê û mijûliyê.
Aqilê wî nagihêje şixûl... û... xizmetan e. Lawoêê... ê...hê...êw.

Lê di bêêê: Wei...wei...wei... heylor... heylor...hey looêêê hey lo lawoêê.
Mamê...nihêrî, roj bilind bû bi sê rîman e. Lê dûrbînî hilda, ji ser barê hêstiran e.
Lê gava da ber çavê xwe, gerandibû li Êla Reşkotan e.
Zîvirî, kire gazî li zîlamê Etmankane go: Lo, ez sond dixûm bi Rabê Alemê,
Bi berdana pîreka, diçine malê bava nayêne ser ra û tevdîran e.
Lawo, de mezina gotiye:

“Bila tevdîr, ji meriva bi mînê, meriv ji tevdîra xwe, ne mine ji parane”

Barê heywanê me giran e. Daynin erdê, barê hêstiran û devan e.
Dikirin, kar û barê kozik û qeleçiyên e. Lê bexê min eman aqilê wî nagihijê hizmeta!
Hema Almas, pêre ketiye xeberdanê, mijûliyan e.
Hê, qîz û bukê Reşkotî, li dorê li hev civiyan e.
Fîlîte Fincê Şemê, wexte rabe ji xewê nava cilwelerînan e.
Lê li camêra, li karwana, digêrê li mehnan e.
Wê bi kute, defa egîdan e. Lê hezar pensid mêre Reşkotî, li Delavê Qîrê,
Li Kaniya Paşo, li wîranê Kevan wê li pêşiya me bibine mêhvan e.
Lawo, em sîh zilam in, panzdehê me bi şeşxane, panzdehê me dest valan e.
Li me ketiye xewê şevan e. Hê rihet ne maye, bi me heft heban e.
Derdê min, ne belavkirina karwan, ne qîrbûna Êla Etmanka,
Ne kûştina me koma zilaman e. Êla me, maye riya qonaxekî
Ez bi silametî, bexê xwe nebime malê, mîna berê fenanî carane
Lê çavê bûka min, maye li rê... û... dirban e. Lawoêê... ê...hê...ê.

Ma Heylooor... heylor... heylor.... heyloor... hey lawoê...hê...ê.ê.
 Lê eman... le wê... Emê eman gidî! Go: Xwangê ro hate qûşlixan e.
 Lê Almasê, çelqemek anî, dabû destan e. Emê vergerande ser qeytanê lêvan e.
 Xatirê xwe xwest, ji para vegeriya, berê xwe dabû karwan e.
 Lê, qîz û bukê Reşkotî, ketine xem û xiyala.
 Satilê xwe, geleka hilda vala bi ser malê xwe da vegeriyan e.
 Filîtê Fincê Şemê, rabûye ji xewê, kurkê xwe avêtiye orta herdû milan e.
 Radibe, berjêr digêre li nava êlê û konan e.
 Lê hatibû derê konê xwe, runiştibû dikire gazî li koma zilaman e.
 Go: Lawo, ez bala xwe didimê, rengê cahillê mi, ne rengê her rokê van gavan e.
 Xelkê mêrê me ne kûştine, talanê me ne biriye.
 Ez li wan dinêrim, stûyê wan xwahre destê wana çire li berhevan e?
 Lawo, ji me çûye cinazê Ezîz, bav û birê wan taze ji pêşiya wan hildan e.
 Eva çi halekî pir giran e! Ev çima ketine xem û xiyala?
 Kê derdê wan, ji min re bê êxê beyan e?
 Heyle ev çima na nihêrin, li ra û tevdîrê... di malan e?Lawoêê... ê...hê...ê.

Lê di bê...:Heylooor... heylor... heyloor...heylor hey lo lo.
 Filîto....bi vê gotinê re jina Filît a mezin, ji aliyê Konê Erebi derkete devran e.
 Go: Filîto, heçî gotinê Almas dibêje ji berêde heya niha, temamê xwe rastin.
 Kes nikare bêje, ne wisan e. Lê berê sibê, derbas bû, karwanê Etmankan e.
 Emê Etmankî, navê wî belav bûye li dînyayê.
 Eman gidî! Derbas bû hat, bona çelqemek qatixê miyan e.
 Qîz û bûkê te meşiyane, eman kaniya binya êlê û konan e.
 Lê gava Emê bi wi hisnî, bi wê girêdanê dîtine,
 Loma stûyê wan xwahre, destê wan a berhevan e.
 Lê Almasê, çav bera Emê daye. Emê kihêl e.
 Loma di bêje fincika.... gûhdirêjan e. Lawoêê... ê...hê...êw.

Heylooor... heylor... heyloor...heylor... hey lo lo.
 Hê lê Filîtê Quto, gava hildaye evê xebera han e. Kuta defa egîdan e.
 Hezar pênsid mêrê Reşkotî, bi tevî hezar pênsid ‘Çeqmaxî’

Li derê kon, dêhna xwe dan li hev civiyan e. Filîtê Quto, kire gazî li cotê xûlaman e.

Go: Lawo, siyarbin xwe bigihînin, Delavê Qîrê,

Kaniya Paşo pêşiya karwanê Etmankane.

Bêjine Mamê, hêstira pêşî, girêdana Emê, şeşxana milê wî paca rê, heta nedê nîşane,

Karwanê wî bi silametî derbas nabe ji Delavê Qîrê, Kaniya Paşo, ji wêranê Kevan e.

Êger, evê xeracê nedê bila nebêje, va bêbextiye, bila ji tedbîra xwe nemîne ji paran e.

Wê niha, li meydanê êzê, bi hezar pênsid Çeqmaxî, lê bibime mêhvan e.

Li sikak meydanê, kî berxe... û... kî beran e? Lawoêê... ê...hê...ê.

Heylooor... heylor... heyloor... hey looêêê hey lo lawo ê...hê...êw.

Xulamê... Filîtê Quto, hildan evê xebera han e.

Hatine, hespê xwe, bi şivane, bi qamçıyan e.

Lê dihatin, silav dane Mamê Gindê, li pêşiya karwan e.

Ji Mamê Gindê re, di gotin Filîtê Qûto, xwediyê evê xebera han e.

Le Mamê... go: Lawo herin bejine Filît; bila îro li navbeyna eşîra,

Li ber cavê alemê, ji me nestîne wê xeraca han e.

Ji me ra, mirin çêtire, serê me ranabê li ber xelqê û hevalan e.

Bi berdanê pîreka, bi Rabbê Alemê!

Em bi silametî herine malê, mîna berê fenaî caran e.

Ezê şevêkê, ji te re lawo hêstira pêşî, bi barê wê ve, girêdana Emê,

Şeşxana milê wî, payîdarê zêra bişînim nîşan e.

Lê eva zilme, heqareteke...pir giran e. Lawoêê... ê...hê...ê.

Heylooor... heylor...heyloor...hey looêêê hey lo lawo ê...hê...êw.

Emê... di go: Mamo xema dilê min giran e. Xeberê qenc û xirab tên, ji şûn û deran e.

Mezina gotîge: **Meriv li pêşiya neyara xelas nabe, bikevê halê hermetan e.**

Mirin bi Xwedê ye, ne bi destê 'evdan e. Mîran, şûrê xwe rast girêdan e.

Lawo herin bêjine Filîtê Quto, bila ji riya xwe nemîn e.

Werê Delavê Qîrê, li me bibê mehvan e.

Lê mirin bi Xwedêye, ne bi destê... ti qûlan e. Lawoêê... ê...hê...ê.

Emê... gava evê xeberê Mamê go:

Emê lawo, Xwedê min li dora serê te, têke qûrban e.

Xeberê mezina, Gotinê Pêşiyane.

Heya roja meriv neyê, meriv yarê diya xwe, qabûl dikê li dewsa bavan e.

Lawo, vê seetê ne wextê van xeberdan û mijûliyan e.

Karwanê me giran e. Em sîh zilamin, panzdehê me bi şeşxane,

Panzdehê me destvalan e. **Dasek na qelînê, koka daran û deviyane**

Lawo, te çima go, evê... pirsê han e? Lawoêê... ê...hê...ê.

Emê... go: Heylooor... heylor... heylooor...heylooor.

Lê go: Gelî Filîtê, xulamê Filîtê Quto lawo sibeye, dilê mi dibêy e.

Îro, bîstê me timam bû, em tên ji karwaniyê ye.

Lawo zerqa tavê, teze daye rû erdê ye.

Lawo, ji pêşiya karwanê me hildin, ji orta rê ye.

Herin bêjine Filîtê Quto, fîncê Şemê ye.

Bêjinê, Emê di go: Hêstira pêşî, şeşxana milê mi, qelendê diya wî Şemê ye.

Lawo, çi ji destê wî tê, bila xwe ji para nedê, rabê serê oxirê ye.

Lawo, mirin bi 'evdan nîne. Bi destê Xwedê ye.

Lê axir sonê, emê rojekê bibine heman gidî mêhvan!

Li qebrê vexwin şerbeta mewtê ye. Lê Mamê hilda, evê xeberê

Go: Heylooor...heylor...heylooor...hey looêêê mirin nêzîke e.Lawoêê... ê...hê...ê.

Lê xulamê... Filîtê Quto, hilda evê xebera han e.

Ji devê kihêlê xwe, di ajon ji para veşeriyane.

Etmanka dikirin, tevdîra kozik û qeleçiyane.

Emê digo: Mamo, xeberê mezinan, Gotinê Pêşiyane.

Berê şefeqê, gûr xwe didine, yeman ciyê bilind, serê çiyane

Belkê di rênin, li deştê, li Beranî keriyane.

Lê mamo, daîma Beran dimîne ji paran e.

Derdê wana ezim, ezê bibime qûrbana we hemiyane.

Ti were, ji piştê berxê xwe veke Meya Mendana,

Kevoka Kedî, Nesxoraçiyê Memolyan,
Lo Bisqê Beyrûdê, Şa'ra Keskerewanê, Çarbihostkê cahilan e.
Lê eman gidî! Ti here bide
Bûka xwe, bila gazincê xwe bikê.....¹¹

¹¹ Beşa yekem a stranê ji vê linkê (xelekê) hatiye deşifrekirin:<http://www.youtube.com/watch?v=8Zya6UQ0-DU>
Beşa duwem a stranê ji vê linkê(xelekê) hatiye deşifrekirin:<http://www.youtube.com/watch?v=zhMkfw1FGhg>

BEŞA DUYEMÎN

NIRXANDIN Û ANALÎZA DESTANÊ

Di vê beşê de piştî ku her sê guhertoyên Destana Felîte Quto bi avayekî hûr û kûr hatinê lêkolînkirin, xalên cuda û hevpar ên hersê guhertoyan hatine tesbîtkirin û pêşkeşkirin. Di vê beşê de teknîka berawirdkirina tekstan hatiye bikaranîn.

1. XALÊN HEVPAR ÊN VARYANTAN

1. Di hersê varyantan de jî dîsgotina (nakarata) stranê ya mîna Heylor heylor, heylor heylor, heylor heylor, heylor heylor heye.
2. Di varyantên Karapête Xaço û Dengbêj Resode bûyer ji devê Şema diya Filîte Quto tên neqilkirin.
3. Di hersê varyantan de jî ciyê ku şer lê diqewime mintîqa Kevanê Qîrê ye.
4. Di varyantên Karapête Xaço û Dengbêj Reso de sedema derketina bûyerê tîfinga binavê “Bazinbelek” e.
5. Her sê wariant jî ji aliyê dirûvê (şikl) ve bêpîvan in. Di hersê varyantan de jî pîvana kitê (hece ölçüsü) tune ye. Her sê varyantan jî ji aliyê pîvana tekstê ve bêpîvan in. Nimûne tekst ji bend, çarîn, şeşbendiyan û hwd. pêk nayên.

2. XALÊN CUDA YÊN VARYANTAN

Di vê beşê de xalên cuda yê tekstan hatine tesbîtkirin. Di vê xebatê de ciyê herî balkêş ev beş e. Jiber ku xalên hevbeş ên tekstan kêr in, lê xalên cuda yê tekstan hem ji xalên hevpar zêdetir hem jî ber firehtir in. Xalên cuda yê wariant ji aliyê hin motîfan ve hatinê tesnîf kirin, da ku kîjan motîf di kîjan wariantê de bi çi şiklî cîdigirin?

2.1. SEDEMA QEWIMÎNA BÛYERÊ

Li Gor Waryanta Karapête XAÇO :

Filîte Quto dixwaze Bazinbelekê weke bacê ji Etmankan bistîne.

Ji ber ku ev jî di nav Kurdan de heqaret e, şer derdikeve.

Li Gor Waryanta Dengbêj RESO:

Filîtê Quto di vê wariantê de wiha dibêje:

“Min sondek xwariye li ber destê Şîrîna Fille ye.

Yan cinazê min ra dikin ji orta meydanê...

Yan jî lawo gere ez bi destê xwe li ber çoka Şîrîna Fille daynim.

Bazinbeleka milê apê tey Mamê...”

Li Gor Waryanta Nesoyê AGIRÎ:

Almas Xanim heye, kulfeta Îsayê Qarakêçî

Li Binêxetê, par van çaxan Îsayê Qarakêçî, hate kuştinê li doza nan e.

Lê bi destê lawê Şehîn Begê, Bozan û Hirço

Mala xwe, ji binê xetê barkir, hate evî welatê han e.

Lê lawo, danî li pêşiya mala kûrapê xwe Filîtê Quto, Êla reşkotan e.

Lawo, hê go em nehatibûne evê karwaniya han e.

Filîtê Quto çend rusipî yê xwe şandine konê Almasê

Bi emrê Xwedê û pêxembera, usulê eşîran e.

Gotiye: “Xwedê sola wî daniye, gotina wî çuyî ye.”

Bila ji min re bê êxin beyân e.

Lê lawo, Almasê bi serde şandiye evê xebera han e.

Gotiye: “Wî bihîstiyê mêrê min par van çaxan li Binêxetê

Hate kuştinê, bi destê lawê Şehîn Begê, li doza nan e.

Roja mirinê eman gidî! Îsayê Qarakêçî

Emniyet nedikir bida destê yê mîna Filît, serê kihêlan e.

Wî bihîstiyê, Xwedê sola min danî ye, axiriyê emr e.

Ez ji kihêla peya bûme, siyar nabim... li gûhdirêjan e.”

Li ser van xeberên Elmas Xanimê Felîtê Quto wiha dibêje:

“Qey li vî welatî, bêhna camêriyek li ti lawê bava naye, zilam qeliyan e?”

Lawo sond xwariye, ji wê rojê, heya evê roja han e.

Heçî, kurê bavan eman gidî! Go bi Almasê re bikevê xeberdanê, mijûliyane

Lê ew dibe kihêl, ez dikevime şûna gûhdirêjan e.

Sund xwariye, bi berdanê pîrekan e.

Ji ber ku Mamê Eliyê Etmên diçe bixeletî bi **Elmas Xanimê** re di peyive buyêr çedibe.

2.2. CIYÊ KU KARWANÊ ETMANKAN DIÇE BAZIRGANIYÊ

Li Gor Waryanta Karapêtê XAÇO :

Di ve varyantê de qala ciye ku Karwanê Etmankan diçe bazirganiyê dike nayê kirin.

Li Gor Waryanta Dengbêj RESO:

Li gor vê varyantê Karwanê Etmankan diçe li Mûsilê bazirganiyê dike.

Li Gor Waryanta Nesoyê AGIRÎ:

Li gor vê varyantê Karwanê Etmankan diçe li Sûricê bazirganiyê dike.

2.3. DABEŞKIRINA FORMÊN BÛYERÊ

Varyantên Dengbêj Reso û Nesoyê Agirî di formên destanan de ne.

Varyanta Karapêtê Xaço di formê stranê de ye.

2.4. ZIMAN Û NAVEROKA VARYANTAN

Waryanta Karapêtê XAÇO û Dengbêj RESO:

Zimanê varyantên Karapêt û Dengbêj Reso zimanê rojane ne û wek gotinên pêşyan, biwêj û vegotinên li derveyê rastiye (îrrasyonel) bi gişti kêr in.

Waryanta Dengbêj Nesoyê AGIRÎ:

Di vê varyantê de dengbêj Nesoyê Agirî ziman gelekî bi hostayî bi kar tîne. Zimanê ve varyantê gelekî dewlemend e, di vê varyantê de biwêj, gotinên pêşyan li gelek çyan tîn xuyakirin. Bi taybet dema xweşikahiya Emê Etmankî tê vegotin bi awayekî li derveyê rastiye (îrrasyonel) behsa xweşikahiya Emê Etmankî tê kirin ku ev ji taybetiyêke cuda dide zimanê varyanta dengbêj Nesoyê Agirî.

2.5. BARÊ KARWANÊ ETMANKAN ÇI YE?

Waryanta Karapêtê XAÇO û Dengbêj RESO:

Di varyantên Karapêt û Reso de qala barê karwanê Etmankan nayê kirin.

Waryanta Dengbêj Nesoyê AGIRÎ:

Di varyanta Dengbêj Neso de tê gotin ku:

“Heylooor, Filîto lawo sibe ye. Min dî Filît bang dikir.

Digo: Elî lawo ez nizanim karwanê we hemû çi û çiyê...?

Eli bankir go: Filîto lawo karwanê me hemû sê qîsme:

Qismek ga, yek qantir, lawo yek deve ye...

Li pêşiyê barê devan xurme, ye, di ortê da bare hêstiran barût û gulle ye...

Serpaşiyê barê ga ji welatê jêr tîm temam genimê spiye.”

ENCAM

Di vê xebatêde min sê varyantên Destana Filîtê Quto mûqayese kirin ku ew jî varyantên; Karapêtê Xaço, Dengbêj Reso û Dengbêj Nesoyê Agirî ne. Destana Filîtê Quto ya Karapêtê Xaço di pirtûka Salihê Kevirbirî ya bi navê “Filîtê Quto” de hatiye çapkirin. Varyanta dengbêj Reso di înternetê de wek text heye, lê varyanta Dengbêj Nesoyê Agirî di înternetê de wek text jî tune ye û di vê xebatê de yekem car wek tekst hatiye deşîfrekirin. Dema min varyanta Nesoyê Agirî deşîfre dikir, carinan min heman hevok bi dehan caran guhdarî dikir, da ku ka bê dengbêj çî dibêje?

Di ve xebatê de ez ghiştim vê encamê ku; xalên hevpar ên her sê varyantan pir kêr in. Sedema vê yekê ji ew e ku her dengbêjek li gor stîla xwe û hûnera xwe destan şîrove kiriye. Ev jî tiştêkî xwezayî ye ku îro jî stranek ji aliyê bi dehan hunermendan ve tê gotin lê naveroka stranê yek be jî stîl ne yek e. Ji bilî van di wê demê de teknolojiya amûrên têkiliyê, çûn û hatin, ji hev haydarbûn pir kêr bû. Lewra dengbêj ji hev îzole diman û wersiyoneke dastanê ya standart bi giştî dernediket. Ji ber van sedeman xalên hevpar ên her sê varyantan pir kêr in. Ev tişt ji bo destanên din jî guncav in.

Xalên hevpar ên her sê varyantan bi giştî dîsgotinên (nakarat) destanan, lêhengên destanan, herêma ku şer lê çebûyî û bê pîvanbûna her sê varyantan a ji aliyê dirûvê ye.

Xalên cuda yê her sê varyantan ji ev in; her sê varyant ji aliyê sedema qewimina bûyerê, ciyê ku Karwanê Etmankan diçe bazirganiyê, dabeşkirina formên bûyerê, ziman û naveroka varyantan û ji aliyên barê Karwanê Etmankan ve ji hev cuda dibin.

Ji bilî van xaleke din a girîng jî ev e ku em di her sê varyantan de rastî zimanê rojane yê wê demê, jiyana gundan, têkiliyên mirovan, têkiliyên aborî, kevneşopiyên gel, têkiliyên biçûk û mezinan û gelek tiştên din ên wan deman tên.

Berhemên dengbêjan di wêjeya kurdî de mîna deryayekê ne. Lê mixabin heta roja me jî bi berfirehî nehatine deşîfrekirin. Lêkolînên ku li ser van berheman hatine kirin jî di asteke kêr de ne. Mixabin saziyên ku xebatan li ser dengbêjiyê jî dikin pir kêr in.

Ji bo ku berhemên dengbêjan werin lekolînkirin û bigihijîn lêkolîneran, xwendekaran, gel û hwd. pêşî divê berhem werin deşîfrekirin û paşî jî divê bîn berhevkirin. Piştî ku berhem hatin deşîfrekirin, derfetên çapkirina wan tune be jî, ev berhem dema ku di cîhana înternetê de werin belav kirin berhem dê bigihîje bi milyonan mirovan. Ev jî dê bibe sedem ku gelek mirov dê bikaribin xwe bigîhînin van berhemên giranbiha û sûdê ji wan bigirin.

ÇAVKANÎ

Azad ZAL (Ed.) **Antolojiya Dengbêjan**, Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê(Çapa Duyem), 2011, İstanbul

Canser KARDAŞ, **Aşğın Sazı Dengbêjin Sesi**, Girişim Matbaacılık, 2017, Ankara

Fadime POLAT (Ed.) **Ortaöğretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı**, Tarih Vakfı Yurt Yayınları, 2010, İstanbul

Mahmut BEĞİK, **Dengêj Resoyê Gopala**, Teza Lisansa Bilind, Zanîngeha Artuklu Mêrdin, 2015

Mihemed Seîd Temel, **Eşîra Reşkotan**, Weşanên Nûbihar, 2016, İstanbul

Salihê Kevirbirî, **Filîtê Quto**, Weşanên Do, 2009, Stenbol

ÇAVKANIYÊN DIJÎTAL

<http://www.atmalilar.org.tr/yazi/203/sn-baki-bakis-beyefendi-ile-roportaj.html>

Strana Karapêtê Xaço: <https://www.youtube.com/watch?v=tzluPC0r4ZY>

Strana dengbêj Reso: <https://www.youtube.com/watch?v=COKNW3mKnPU>

Beşa yekem a strana dengbêj Neso: <http://www.youtube.com/watch?v=8Zya6UQ0-DU>

Beşa duwem a strana dengbêj Neso:

<http://www.youtube.com/watch?v=zhMkfw1FGhg>



T.C.

**Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı
Tezsiz Yüksek Lisans Projesi**

**FELÎTÊ QUTO DESTANI’NIN
ÜÇ VARYANTININ KARŞILAŞTIRMASI**

Hikmet ALPAR

13721091

Danışman

Yar. Doç. Dr. Mustafa ASLAN

Mardin 2018